Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1127 | 20-Berfanbar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | 423165

9'emîn Mihrîcana Çand û Hunerê ya Rojava

Birûc Resûl/Qamişlo

9`emîn Mihrîcana Çand û Hunerê ya Rojava bi diruşmeya "Em ê Li ber Serê Her Şehîdekî Sirûdeke Azadiyê Biçînin" di 15 Berfanbarê de dest pê kir, di roja xwe ya 5'an de dewam dike, li gorî bernameyê mihrîcanê 165 rewşenbîr, nivîskar û hunermend bi berhemên xwe yên çandî tê de beşdar dibin û mihrîcan di 28'ê Berfanbarê bi dawî dibe.

Di 9`emîn Mihrîcana Çand û Hunerî ya Rojava ku 15'ê Berfanbarê hatibû destpêkirin, dewam dike, di mihrîcanê de rewşenbîr, nivîskar, helbestvan û hunermend ji gelek herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li navenda Yekîtiya Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) li hev dicivin. Her wiha wê 2 heftiyan berdewam bike.

Di heman mijarê de endamê komîteya emedekar Zekeriya Efrîn ji rojnemeya me re diyar kir ku di festîvala îsal de gelek çalakî, semînerên wêjeyî, çandî, hunerî, siyasî û civakî hene û wiha got: "festîvala ku bi duruşmeya 'Emê Li Ser Serê Her Şehîdekî Em Sirûdeke Azadiyê Biçînin' îsal bi awayekî kurt hat li dar xistin, her wiha tiştê ku festîvalê di cîhanê de cuda dike, beşdariya mezin a rewşenbîran e ku di festîvalê de gihîşt 165 rewşenbîr, helbestvan, nivîskar û hwd..., ku hejmara beşdaran par 150 kes bû. Di heman demê de di vê festîvalê de em hewldsnekî pir mizin da ku cureyên çandî yên cuda, di nav de helbest, çîrok, mûzîk, şano, sînema û ders pêşkêş bike. Bi vî awayî ku festîval bibe derfetek ji bo hemû rewşenbîran."

Bernameya çalakiyên 9'emîn Mihrîcana Rojava ya Çand û Hunerê

Roja Yekemîn:
Di destpêkirina mihrîcanê de li ser navê Desteya Çandê, Komîteya Amadekar, Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê, Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriy û Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê axaftin hatin kirin.

Herwiha hunermedn Elî Kurdî, Şadî Tildarî, Dilgeş Tildarî û Ferhad Beghenadî beşdarbûn. Panêlek bi navê 'Pirtûka Rêzimana Kurmancî ya SZK` di navbera qebûlkirin û rexneyê de' ji aliyê Ferhad Mûsa, Viyan Hesen û Ferîd Xelîl ve hat dayîn û ji aliyê Xoşman Qado ve hat birêvebirin.

Di bernameya Êvara Qolincên Xabûrê de Azad Osî, Cindî Metînî, Jînda Mihemed, Dilsoz Îbrahîm, Îmran Yûsif, Hena Daûd, Imad Hemdî û Şahînê Dilbikul beşdar bûn.

Di heman çarçoveyê de derhêner Mûcan Kafûsî jî beşdar bû.

Roja 2`emîn:
Ji aliyê akademesiyan Ferîd Sadûn semînerek bi navê Pergala Hunerî di Helbesta Cegerxwîn de hat dayîn, herwiha semînerk bi navê Romantîzm di Helbesta Cegerxwîn de ji aliyê nivîskar Xalis Misewir ve hat dayîn.

Di şeva helbestên kurdî de Îbrahîm Silêman, Can Ibrahim, Cemil Dahir, Hesîna Ehmed, Riyad Mistefa, Telal Şêx, Xembar Gul û Narîn Metînî beşdar bûn.

Herwiha Derhêner Zeyno Hadî di beşê sînemayê de beşdar bû.

Roja Sêyemîn:
Ji aliyê helbestvan Konê Reş ve semînerek bi navê Çîroka min a nivîsandinê û ji aliyê nivîskar Selahedîn Seyda semînerek bi navê Serhijmartin û Plankirin hatin dayîn.

Di Êvara Amûda Şewatan de helbestên erebî ji aliyê Îbrahîm Berekat, Iqbal Receb, Aya Hisên, Samiya Ibrahîm, Ebîr Dirêî, Îmad Emûna û Merwan Şêxê hatin xwendin.

Herwiha Çîroka Erebî ji aliyê Amir Ferso, Şems Enter, Taha Hisên û Mehmûd Hesen ve hatin xwendin

Di beşa sînemayê de jî semînerek bi navê Saeta Sifir a derhêner Hawar Rehîmî hat dayîn.

Roja 4`emîn:
Simînara mamoste Faris Osman a bi nave Kurdolojî û Simînara mamoste Dilawerê Zengî a bi nave Komeleya Xwebûn hat dayîn.

Di Şeva helbest û çîrokan de Beşîra Derwîş, Ciwan Silo, Helima Xelîl, Yasmîn Meşayix, Selîm Mecîd, Diyaa Iskender

Ebdilbarî Ehmê, Ebdilcabir Hebîb, Erîfe Bekir, Fewaz Osê, Kamîran Şêxê û Ebdilrehman Mihemed beşdar bûn.

Di beşa Belgefilman de bi navê'Dartaş' a Derhêner xelîl sehracerd semîner hat dayîn.

Roja 5`emîn
Simînera Mihemmed Mistefa a bi navê Hişmendiya Siyasî û Tewriyên Siyasî û Simînara mamoste Dijwar Axaa a bi navê Medyaya Dîjîtal Erênî û Neyêniyên wê hatin dayîn.

Di heman çarîoveyê de Pirtûka Rêber Hebûn hat imzekirin.

Di beşa sînemayê de filimê 'Wilatî Jinanî Jêr Zewî' a Derhêner Rêkewt Hemê tewfîq nîqaşkirin.

Roja 6`emîn:
-Simînara Silêman Elyas Rewşa şûnwaran li herêma Cezîrê û Simînara Çinar Salih Bîreweriya Hestyarî û Analîtîk wê bê dayîn.

-Di Şeva çîrokên kurdî de Botan Hoşê, Alan Abdellah, Ednan Mistefa, Ciwan Ebdal, Luqman Yûsif - Qadir Egîd û Rojîn Mihemed Mûsa wê beşdar bibin.

-Di beşê Sînemayê Bîrxane a Derhêner Bilal Korkut û Jîneniîgariya helbestvan Arjan Arî.

Roja 7`emîn:
-Mamoste Diyar Buhtî (Xatirxwestin ji Melayê Cezîrî).

-Diyloga vekirî derbarê helbest, ziman û kelepûrê.

-Xwendina helbestên Melayê Cezîrî ji aliyê Mihemed Eşref û Îbrahîm Silêman.

Di Êvara Ava Mezin de :Bavê Fenar, Cenbelî Cenbelî , Cawîdan Qasim, Rêzan Mihyeddîn, Ebdilrehman Silo, Îmad Remezan, Fayiq Mihemed Sidîq, Gulistan Ehmed, Mihemed Zekî, Yusif Bavê Ceger, Ehmed Ciwêl û Kaniya Reş

Di beşê sînemayê de: Sibe dêreng e a derhêner Mezlûm Demir

Roja 8`emîn:
-Şano ji bo zarokan a derhêner Welîd Omer û Şano Cuha û Şah Zafran a nivîskar û derhêner Welîd Omer

Panêla Guhertinana demografiya herêmên dagirkirî: Orhan Kemal, Zîlan Elî, Welîd Bekir û Fadil Mihemed

Êvara ava mezin: Ehmed Ismayîl - Bextreş Koçer - Ciwan Dêrikî, Diyala Eli - Rewan Bedirxan - Rûken Elîşêr - Ronîstêr Mîrza - Ebdilhelîm Ehmed Lawî - Izedîn Silêman – Lorens Can - Mihemed Emîn Sadûn – Mehmûd Ebdo – Melevan Resûl, Hêv Mihemed Ebdê.

-Şanoya Dûrî : Ji kurteçîroka Anton Çexov hatiye girtin a nivîskar Muhtedî Xalib û amadekar û derhêner Ebdilcabir Hebîb.

Roja 9`emîn:
-Simînara Deham Ebdilfetah Li ser pirs û pirsgirêkên ziman.

-Êvara amûda şewatan: Îdrîs Hac Tahir, Arşek Baravî, Beşîr Mela Newaf, Bêrîvan Faris, Pêşeroj Cewherî, Hesen Hesen, Xelîl Alûcî, Dilyar Hebîb û Kurdiyar Derêyî.

-Sînema: Blooming in the desert de Benedetta Argentieri.

Roja 10`emîn

-Simînara Munîr Şêxê (Têgîna Demê di Karên Hunerî de).

Simînara Ebdilbarî Ehmê (Xwendineke Rexneyî der barê hişmendiya Siyasî û Netewî ya Kurdî).

-Êvara çemê Çetelê: Xemgînê Remo - Mahîn Şêxanî - Ahmed Fewzî Dilyar Osê - Îbrahîm Şehab - Ebdulqehar Silo

-Sinema: Aso - Aazad Evdike.

Roja 11`emîn:
-Panel: Rewşa saziyên çandî li ber ronahiya girêdan û rakêşanên siyasî

Beşdar :Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê

Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê.

Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê.

Yekîtiya Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK)

Moderator: Welîd Çolî

Roja 12`emîn:
-Simînara Barzo Mehmûd: (Ezmûna min a nivîsandinê).

-Simînara Ebdilwehab Bîranî (Sînemaya Kurdî).

-Şano: Navê şanoyê: Şehîdên Ewlekariya Hundirîn a Nivîskar û derhêner Mişel El-Hisên.

Roja 13`emîn:
-Simînara rexneyî ya Abdilmecîd Xelef (Roman li Rojava).

-Simînara Osman Ehmed (Têgîna Wergera Nûjen).

-Îmzekirina pirtûka antolojya helbesta nûjen a Rojava.

-Simema: Cemîl Horo a derhêner Zakariya Afrîn.

Roja 14`emîn:
Li ser 2 kesên serkeftî wê xelat ji wan re xelat werin belavkirin, her wiha nirxê xelatê jî hezar dolarê emerîkî be.

Simînara Welîd Çolî (Doza Kurdî di porojeya netewya Demoqratîk çiye).

Simînara Alan Remo (Pirsgirêkên jîngehê û pêşniyarên çareseriyê).

Bi mûzîkên gelêrî yên Şivan cizîrî, Hacî mûsa, Xalid cûdî, Îmad ibrahîm, Eyşê serdar, Haystan ekrem, Rewşen mihemed û Rozelîn ibrahîm wê Mihrîcan were bi dawî kirin.

Sudoku:Pirs 39

	3	9	7			8		
							4	
						1	3	9
	8		9	7	1			2
	7	1		5		4	9	
9			8	4	6		5	
2	6	5						
	4							
		7			3	6	8	

Sudoku: Bersiv 38

1	3	6	2	9	7	8	4	5
9	7	4	5	1	8	2	3	6
2	8	5	3	6	4	1	7	9
6	2	1	7	3	5	4	9	8
7	5	3	4	8	9	6	1	2
4	9	8	6	2	1	7	5	3
3	1	9	8	7	6	5	2	4
8	4	7	9	5	2	3	6	1
5	6	2	1	4	3	9	8	7

FERHENGA BIWÊJAN

Mera li ser ti zînan neberiqe:
- Ez hêvî dikim ku nebe bûk. (Berê, hesp yan jî mehîn zîn dikirin, bûk lê siwar dikirin. Ji ber ku xişriyên bûkê jî dixistin stûyê wê li ser zîn diberiqiya)

Xwedê girrê bide te, neynokan jî ji te bistîne:
- Xwedê te perîşan bike; xwedê derdê bêderman bide te.

LI SER BÊBANDORIYÊ

Apê Faris, çi li malê, çi li ber garis:
- Hebûn û nebûna wî weke hev e; bi kêrî tiştekî nayê; faydeya wî nagihe ti kesî.

Bendekeya vala ye:
- Bi heman wateyê.

Birîna bi heval re weke tîra di kendal re:
- Mirov zûbizû bi êşa kesên din nahese. Birîndariya kesên din çawa ku tîrek biçe li kendal bikeve, ti bandorê li mirov nake.

Eniya min jê xwêdan nade:
- Mijara hûn behsê dikin, bandorê li min nake, têkiliya wê bi min re nîne.

Guhê kerê wî şil nabe:
- Bi heman wateyê.

Ji destê wî derket:
- Êdî nikare bike; êdî di destê hineke din de ye; êdî hêza wî nagihiyê; bandora wî nemaye.

Kundirê vala ye:
- Ji bo kesê bi kêrî tiştekî neyê tê gotin.
Li eynê xwe derneanî.
- Bandor lê nebû; çawa ku nedîtibe; çawa ku nebihîstibe; çawa ku ne ji wî re hatibe gotin.

Ne ti kinês e:
- Ji bo kesê bi kêrî tiştekî neyê tê gotin.

Pişta guhê wî jî xwêdan nade:
- Bandorê lê nake; ne li xema wî ye; ha jê re hatî gotin ha nehatî gotin; çawa ku nebihîstibe.

Serî berdaye:
- Ji destê wî derketiye; bêbandor bûye; êdî nikare tiştekî pê bike.

Xwe ser ve nebir/xwe bi ser ve nebir:
- Çawa ku ne wî kiribe; behsa mijarê nekir; bandor lê nebû.

LI SER XWEGIRANKIRIN Û DERENGIYÊ

Apê Faris çû ber garis:
- Qediya; nema; te xwe negihandiyê.

Bû berûşa Behlûl/bûye dîzika Behlûl:
- Pir dem lê çû; pir dirêj bû.

Bû hathata Mîrê Bohta:
- Ev demeke dirêj e em li bendê ne lê nayê.

Çûyîn bû ew çûyîn:
- Dema yek diçe ciyekî lê zû venagere hingê tê gotin.

Dizê bostana derketin zivistana:
- Pir dereng pêk hat; di dema xwe de pêk nehat.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Hevpeymana Civakî yek ji destkeftiyên şoreşa 19'ê Tîrmehê ye

Endama Komîteya Sazkirina Hevpeymana Civakî, Perwîn Yûsiv desthnîşan kir ku Hevpeymana Civakî yek ji desthkeftiyên şoreşa 19'ê Tîrmehê ye. Di heman demê de Perwîn da zanîn ku ev hevpeyman bi nêrînên gelên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat li gorî hewcedariya bi xwerêvebirin û biryarsthndinê hat sazkirin.**R-5**

Kar û xebatên Desteya Jin Ya Herêma Cezîrê yên salekê

Desteya jin ya herêma Cizîrê di sala 2023'an de ji bo rêxistinkirin, parastin û pêşxistina jin û civakê gelek kar û xebat da meşandin. Cîgera Desteya Jin ya herêma Cizîrê Hiweyda Mihemed diyar kir ku wan di nava salekê de ji bo jin û civakê gelek xebatên giranbiha dane meşandin.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1127 | 20-Berfanbar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

TEV-DEM:DERIYÊ PERWERDE Û RÊXISTINKIRINA CIVAKÊ YE

Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê ku di nava xwe de rêxistin, sendîka, komele, meclîs, sendîkayên pîşeyî, weqif, navendên lêkolîn û perwerdehîyê dihewîne, li ser esasê Netewea Demokratîk û ji bo gihiştina civaka exlaqî, polîtîk, ekolojîk û azadiya jinê di nava salekê de xebatên berfireh da meşandin, herwiha ji bo parastina nirxên civakê, jiyana hevbeş, cihêrengiya çandî û etnîkî û parastina mafên beşên civakê gavên girîng avêtin.**R-4**

Kar û xebatên şaredariyên herêma Cizîrê yên 2023'an

Şaredariyên herêma Cizîrê di sala 2023'an de 198 projeyên xizmetguzariyê pêk anîn, herwiha 54 proje jî kar û xebat ji bo qedandina wan tên kirin. cîgira Hevserokatiya Desteya Rêvebirina Herêmî ya herêma Cizîrê, Bêrîvan Umer diyar kir ku êrişên dagirkeriya Tirk li pêş xebatên şaredariyan dibe astêng.**R-6**

'TEV-ÇAND ji bo pêşxistin û parastina çand û hunera resen e'

Hevseroka TEV-ÇAND'ê Sumeya Mihemed da zanîn ku bi armanca pêşxistin û parastina çand û hunera gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya resen, TEV-ÇAND'ê xebatên xwe didomîne. Herwiha Sumeya anî ser ziman ku bernameya wan ya hunerî ya îsal dagirtî bû, tevî êrîşên dagirkeriya Tirk jî gelek festîval li dar ketin û gel tevlî çalakiyên hunerî dibûn.**R-7**

'Girtina rojnamevanan, dîlgirtina dengê civakê ye'

Rojnamevanê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê desthnîşan kirin ku revandina rojnamevanan dîlgirtina Rojnamevanan e. Herwiha siyaseta PDK û AKP'ê hertim rojnamevanan hedef digre. Rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê anîn ziman ku hemû hewildanên ji bo azadiya Silêman Ehmed bêbersiv mane.**R-3**

Zewaca bi temenê biçûk pirsgirêk nayê dîtin — Nehîr pale — R-2
Der barê mihrîcana Rojava ya Çand û Hunerê de çend têbînî... — Kemal Necim — R-7
3 şerên cîhanê — Farûk Sakik — R-5
Dorpêça Şêx Meqsûd û Şehbayê — Zekî Bedran — R-5

Kar û xebatên Desteya Jin Ya Herêma Cezîrê yên salekê

Desteya jin ya herêma Cizîrê di sala 2023'an de ji bo rêxistinkirin, parastin û pêşxistina jin û civakê gelek kar û xebat da meşandin. Cîgera Desteya Jin ya herêma Cizîrê Hiweyda Mihemed diyar kir ku wan di nava salekê de ji bo jin û civakê gelek xebatên giranbiha dane meşandin.

Deriya Çiya\Qamişlo

Rêveberiya jin yek ji desteyên Meclisa Rêveber e, di 21'ê Çileya 2014'an de bi raghandina Rêveberiya Xweseriya Demukratîk hate avakirin. Desteyeke fermî ye ku têkildarî pirsgirêkên jinan ên civakî, aborî, çandê, siyasî û hiqûqî ye. Têgeha Neteweya Demukratîk di xebata xwe de esas digire û ji bo xurtkirina peransîba edaleta civakî û bidestxistina cihêkariyê dixebite, di berjewendiya jinê de erênî ye û têgehên paşverû yên ku pêşketina civakê asteng dikin ji holê radike da ku bighêje civakek demukratîk, zayendî, ekolojî û azad. Li gorî vê yekê di hemû qadê têkildarî jinan de pilansaziyên pêşketina strajîk çêdike, mafên wan diparêze û di hemû Saziyên Rêveberiya Xweseriya Demuqratîk de destekê dide qanûnên ku jinan eleqdar dikin.

Derbarê kar û xebatên Desteya Jin ya herêma Cizîrê yên sala 2023'an, Cîgera Desteya Jin ya herêma Cizîrê Hiweyda Mihemed ji rojnameya me re axivî.

Kar û xebatên Desteya Jin

Hiweyda Mihemed derbarê kar û xebatên Desteya Jin de wiha axivî: "Kar û xebatên me bêhtirî xwe di avakirina civakek demukrat, exlaqî û wekhevî di navbera jin û mêr de ne. Herwiha ji bo geşkirina têkoşîn û berxwedana jinê ya li hember hemû cûreyên tundiyê yên ku li ser tên meşandin, kar dikin. Di heman demê de em hewil didin rola jinê di hundirê civak û saziyan de aktîvtir bikin, da ku jin di hundirê civakê de bibe pêşeng û xwediya hebûn û biriyarê, ji ber ku jin bingeh û hebûna vê civakê ye. Herweha karê me li ser 4 ofîsan tê dabeşkirin, bi giştî 145 jin di van navendan de kar dikin."

Ofîsên Desteya Jin

-Ofîsa yekem; Ofîsa baldarî û parestinê, ku ji milê cîgerê desteyê ve tê meşandin. Mijarên wê wek avakirina bexçeyên zarokan, heya niha jî 17 bexçeyên zarokan ku ji temenê mehek heya 3 salane li seranserî herêma Cezîrê li Rimêlan, Çilaxa, Terbespiyê, Hesekê, Amûdê, Dirbêsiyê, Tiltemer û bi giraniya xwe gelek li Bajarê Qamişlo hatine vekirin. Arman ji vê jî alîkarî bi jinên karmend re ye. Dema dewam bexçeyê jî bi dema dewama dayikên wan re ye, di hundirê vê bexçê de hemû pêwîstiyên ku zarok hewcedarî wê ye tê pêkanîn û peydakirin. Li hember wê jî 7 navenda Ehlen ya Simsim li Çelaxa, Terbespî, Qamişlo, Amûdê û li Dirbêsiyê jî hatine avakirin. Ev navend ji zarokên ku temenê wan ji 3 salî heya 8 salî re ne. Bernameyên wê hem lîstokin û hem jî fêrkirin e, bernameya fêrkirinê jî di riya lîstokan re tê parvekirin.

Di heman demê de ji ber van rewşên şer yên ku heyî, gelek zarok bê xwedî û mal mane, navenek li bajarê Hesekê ji van zarokan re hatiye avakirin ku tê de hemû pêdiviyên wan pêk tînin. Herweha zarokên tebenî jî li cem me hene, ew malbatên ku zarokên wan nînin bi riya şert û mercên ku me danîne tên wan dibin. Li gor sala 2023'an de 8 zarok hatine tebenî kirin.

-Ofîsa duyem; ofîsa Parestine jinan ne, ev ofîs bi taybet jî ji bo jinên ku rastî şideta fîzîkî, derûnî, tendurestî û zayendî tên kirin hatiye avakirin. Bi têkiliya bi Asayişê wan dibin malê parestinê. Ev mal jî li ser sê qonaxan hatine avakirin.

Qonaxa destpêkê em wan dibin navendên Asayişê ev mal jî demkîne tenê 24 demjimêran dimînin, heger pirsgirêk çareser bû piştî wê demê vedigerin malê xwe, eger çareser nebû em wan dibin qonaxa didiwan, ku yek li Qamişlo û yek li Hesekê hatiye avakirin û dikarin lê bi mehan bimînin, eger ku pirsgêkê wan hîn dirêj kir û ne hat çareserkirin, derbasî qonaxa 3'yan dibin ku ev mala dayem e, tê de bi salan dimînin. Ev mal li ser bernameyekê tê meşandin. Bernameya malê; Fêrkirina zimanê dayikê, pêşxistina jêhatiya wan wek dirûtin, çêkirina hin karên destan(quçkirin, xêzkirin) û pîşxistina bernameyên xwe yên hişyarkirinê.

Rêjeya jinên ku di sala 2023'an de hatin van malan 92 jin bûn. Ji wan 81 pirsgirêkên wan hatin e çareserkirin û vegeriyan malên xwe.

-Ofîsa Siyem; Ofîsa Amara ye, ji bo rêveberiya piskolojî ji jin û zarokan re ye. 4 navendên wê hene li Rimêlan, Qamişlo, Hesekê û li Tiltemirê. Ev istîşare jî hem di riya perwerdeyê û hem di riya celsatên yakane û komane re ne.

-Ofêsa çarem; Ofîsa pilankirinê, ev ofîs bêhtirî xwe bi pirojan ve girêdayî ye.

Wek din ofîsa malî, raghandin û arşîf hene.

Pirojeyên sala 2023'an

Pirojeya gilasên bilastêk li bajarê Terbespiyê, armanc jê ku jin tê de kar bikin.

Pirojeya vekirina navendekê ji nexweşiyên mêjî re, li bajarê Çilaxa. Pirojeya çaksazkirina akadimiya Narîn Mûş.

Pirojeya vekirina navdan li gor pêdiviyan wek navenda Ehlen ya Simsim.

Pirojeyên ku nehatine pêkanîn

Pirojeya vekirina navendên berçavkirina zû ji bo pencesêra singê ji jinan re nehat pêkanîn, ew jî ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk ku di vê dema dawî de binesaziya herêmê hedef girt, ev piroje hat rawestandin.

Jinên ku xalîçe û selikan çêdikin mîrateya xwe ya dîrokî diparêzin

Jinên ku li bajarê Minbicê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê xalîçe diçêrînin û selikan çêdikin, parastina mîrateya dîrokî ya berê didomînin.

Çêkirina xalîçe û selikên ku bi rêbazên kevneşopî tên çêkirin, tevî serdestiya pîşesaziya moderin a di sedsala 21'ê de, çandeke ku heta îro bi destên jinan xwe parastiye. Jinên ku di wê baweriyê de ne ku parastina mîrateya çandî erka wan e, tevî pêşketina pîşesaziyê jî dest ji vê mîrateyê bernadin û xebatên xwe yên destan didomînin.

Amuna El-Berhawî ya 75 salî ku ji gundê El-Kack ê rojhilatê bajarê Minbicê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye, di çêkirina xalîçeyan de hosta ye. Ammuna El-Berhawî ku wek aşê genim hîn jî amûrên ku di dehsalên borî de bi kar aniye û diparêze wiha got: "Ez 20 salî bûm diya min fêrî çêkirina xalîçeyan kir. Me destpêkê postê pezan jê dikir dû re hiriya wan bi şehekî diranê wî zirav paqij dikir. Piştre me hiriyê wisa rêz di hiriyên ku bûne têlê tenik me rêz dikir kir. Me têlên tenik stûrtir û hişktir dikirin da ku ji bo xalîçeyê amade bin."

Ji bo çêkirina xalîçeyek salek pêwîst e

Ammuna Al-Barhawî di berdevamiya axaftina xwe de destnîşan kir ku ji bo çêkirina xalîçeyek salek pêwîst e û wiha pê de çû: "Xebata kolektîf her çi dibe bila bibe kar hêsantir dike. Ji ber vê jî wextek kêm û hesas jê re divê. Xalîçeyên ku bi destên xwe çêkirin min da keç û hinek hevalên xwe. Xalîçeyên ku min beriya 40 û beriya 35 sal çêkiribû min gel xwe veşartiye."

Kevirên aşê bi kar tînin

Amûna El-Berhawî ya ku îro hîna jî hiriyê direşîne, rexne li rîsên ku îro tên çêkirin kir û got: "Ez gelek caran riştên destan bi kar tînim, ji ber ku rîsên bi makîneyan tên çêkirin pir tenik û bê kalîte ne. Ji xeynî xalîçeyan, jinan ji bo şikandina genim, ceh û nîskê kevirên aşên yên beriya 150 salam tên bikaranîn. Di salên borî de ji ber ku makîneyên moderin tunebûn me genim bi dasên destan berhev dikir, paşê dikeland û di aşê de çêdikir."

Ammouna Al-Barhawî diyar kir ku bikaranîna aş karekî kolektîf dixwaze û wan tiştan anî ziman: "Mînak dema min genim çêdikir 2 jin hev re kar dike, berê jin li ber kevirên aşê kom dibûn danûstandina kar dikirin. Amûrek herî kevin e ku hê jî di roja me ya îro de tê bikaranîn."

Selikan çêdike

Werda El-Îbrahîm a 70 salî ji gundê El-Bireh dijî selikên ku di 10 saliya xwe de ji xwişk û xaltiya xwe fêr bûye çêdike wiha got: "Çêkirina selikan yek ji hunerên destan e ku jinan di demên borî de bi dest xistiye. Di depokirin û veguhestina nan, sebze, fêkî û tiştên wekî wan de gelek bikaranîna wê heye. Tevî temenê min ê mezin, ez çêkirina selikan wekî hobî û mîrateyek ku bîranînên min tînin bîra min dibînim. Ez hê jî girîngî didim hunerên destan ên kevin. Lê belê, ji ber amûrên nûjen rêjeya kirîna selikan kêm dibe."

Werde El-Îbrahîm, anî ziman ku ew selikan ji qamîşan çêdikin, şekil û bejna wan li gorî daxwazê tên guhertin û wiha dawî li gotinên xwe anî: "Em ji qamîşên ku li qeraxên çem û robaran şîn dibin çêdikin. Yên rast û giroverên ku ez çêdikim ji bo xemkê li dîwaran tên daliqandin."**NÛ JINHA**

Ji Pênûsa Jin

Zewaca bi temenê biçûk pirsgirêk nayê dîtin

Nehîr Pale

Di nava civakê de hinek buyer diqewimin mîna pirsgirêk nayên dîtin û bertek li hemberî van buyeran ji civakê dernakeve. Mînak keçeke 16 salî hem ducanî bû û hem jî hatiye berdan. Li beramberî vê rewşê eger mirov şoq bimîne, yan lanet li civak û malbata wê bîne dîse ne çareseriye û ew keçik ji wê rewşê nayê rizgar kirin. Dibe ku di nava civakê de hinek hebin bêjin ma ew çarenûsa wê ye û bila bibêje El-Hemdullah, hinek jî wê keçika biçûk sûcdar bikin. Gelo ma wê zarokê biryara xwe bi xwe girtiye ku bi temenekî biçûk bizewicê? Malbatê wê ew di temenê 14 salî de dane zewcandin û civakê jî pîroz kiriye, di vir de kî sûcdar e? Misoger malbat û civak e.

Civak tu carî destûr nade ku insan di temenê biçûk de bibe xwedî îrade û bi xwe çarenûsa xwe diyar bike, bi taybet jin di temenê biçûk de her tim cahil û aqil biçûk e, li gorî zîhniyeta civakê jin nizane xwe biparêze, aqil biçûke, ew nikare biryar ji bo xwe bigre, her tim hinek hene şûna wê bifikirin û biryar bigirin. Hemû keçikên ku malbat wan di temenê biçûk de dizewicîne, wê kî aliyê exlaqî û qanûnî de berpirsyartiya wan rabike? Malbat û civak wan zarokan dixin wê rewşê de û wexta ku pirsgirêk bi wan re çêdibin, kesek berpirsyartiya wan ranake û nabe alîkar, berevajî hinek rêbazên ku navê kevneşopî lê kirine li ser wan zarokan didin meşandin.

Mijara ku ez xeter li ser rewşa civakî dibînim diyardeya zewaca bi temenê biçûk zêde bûye û di encama wê de gelek buyerên ku manewî giranin diqewim in. Rojane pirsgirêkên jin û mêr têne Mala Jin. Kesên ku tên di vê mijarê de li Mala Jin gazinc dikin, ferz dikin ku bi rêbazê berdanê dawî li pirsgirêkê were. Mala Jin jî her hewl dide ku pirsgirêkê çareser bike lê dema ku rêbazê berdanê li ser wan tê ferz kirin ew dozê radikin dadgehê û dadgeh vedigere qanunan da ku pirsgirêkê çareser bike.

Pirsgirêka zewaca bi temenê biçûk ne exlaqî û ne jî zagonî çareser dibe, ji ber civak weke pirsgirêk nabîne. Dema ku malbat keça xwe bi temenekî biçûk dizewicîne kesek wan lome nake, ne jî şerm û guneh tê dîtin. Pirsgirêk hişmendî û exlaqî ye. Malbata ku keçên xwe di temenekî biçûk de dizewicînin jêhatî têne dîtin û li pêşiya civaka xwe pesnê xwe didin. Kesek nayîne bîra wan ku hîna temenê keça wan biçûke yan jî hesab ji wan bixwaze. Pir rehet dikarin bibêjin ku ew bi keçên xwe serbilind in ji ber xwazginiyên wan zû hatine. Beşdarî dawetê dibin û wan pîroz dikin. Malbatên ku keçên wan zû nezewicin civak li beramberî wan dikeve nava şik û gumanan de û destê bi lêpirsîna exlaqê wan dike. Ji xwe eger keçik nexwîne û temenê wê gihîştibe 20 salî êdî dibêjin ew di malê de maye û nema kesek qîma xwe pê tîne. Heyanî ku civak di aliyê hişmendî de zewaca bi temenê biçûk asayî bibîne, exlaqî guneh nebîne û zagonî qedexe neke, wê qurbaniyên vê diyardeyê zêde bibin.

'TEV-ÇAND ji bo pêşxistin û parastina çand û hunera resen e'

Hevseroka TEV-ÇAND'ê Sumeya Mihemed da zanîn ku bi armanca pêşxistin û parastina çand û hunera gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya resen, TEV-ÇAND'ê xebatên xwe didomîne. Herwiha Sumeya anî ser ziman ku bernameya wan ya hunerî ya îsal dagirtî bû, tevî êrîşên dagirkeriya Tirk jî gelek festîval li dar ketin û gel tevlî çalakiyên hunerî dibûn.

Reşo Mihemed/ Qamişlo

Tevgera Çand û Hunera Netewa Demokratîk a Mezopotamiya(TEV-ÇAND) yek ji tevger û bizaveke hunerî û çandî ye ku di sala 2006'an li Rojava hatiye damezrandin. Ji ber siyaseta ku hikumeta Şamê ya hemû xebatên hunerî, perwerdekirin, siyaset û rewşenbîrî yên têkildarî gelê kurd bûn qedexe dikir, TEV- ÇAND bi awayekî veşartî xebat dikir. Ji wê demê heya berî şoreşa 19'ê Tîrmehê TEV-ÇAND'ê xebat di mercên zehmet de dikir. Piştî ku şoreşa 19'ê Tîrmehê dest pê kir, êdî di atmosfereke guncaw de xebata xwe bi coşeke mezin berdewam kir. Ev tevger ji bo asta çand û hunera kurdên Rojava li nik sazî û navendên din yên mijûlî pirsa çandê dibin, cihê vejîn û pêşkistinê ye.

TEV-ÇAND di bin diruşmeya " Em wek tevgera çand û hunera Rojavayê Kurdistanê erkdar û berpirsyarê çand û hunera Rojavayê Kurdistanê ne. Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyayê birêxistinkirî û bitevgerkirî ne."

Festîvalên ku ji aliyê TEV-ÇAND'ê ve hatin lidarxistin jî ev bûn:

Festîvala Şehîd Yekta Herkol a Şanoyê, di 27'ê Adarê de li bajarê Qamişlo li ser asta cîhanî hat lidaraxistin û 5 rojan berdewam kir.

Festîvala Orkêş a Mozîkê di 11'ê Gulanê de li Qamişlo li dar ket û 5 rojan berdewam kir.

Festîvala Şano ya Zarokan Mozîkê di 1'ê Îlûnê de li ser asta Kantonên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dar ket û 3 rojan berdewam kir.

Festîvala Şehîd Ronahî Bawer a Govendê li Rimêlanê di 16'ê Îlûnê de li Rimêlanê hat lidarxistin û 4 rojan berdewam kir.

Festîvala Çanda Netewa Demokratîk di 9'ê Mijdarê de li Tilberekê hat li darxistin û 2 rojan berdewam kir.

Li kêleka van festîvalan çalakî û perwerdeyên cihêreng ji aliyê Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamiya ve dihatin domandin, girêdayî heman mijaran jî hevseroka TEV-ÇAND'ê ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sumeya Mihemed ji rojnameya me re axivî.

Xebata çandî û hunerî

Sumeya Mihemed di derbarê kar û xebata TEV-ÇAND'ê de wiha got: "Ji destpêka 2023'an heta meha Berfanbarê ve, pilana salê dagirtî bû ji çalakiyên çandî û hunerî û perwerdeyên cihêreng. TEV-ÇAND xebata xwe li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê, herwiha Şam û Libnanê jî dide meşandin. Bi armanca parastin û pêşxistina çandî, hunerî ya resen, herwiha vekirina deriyê derfetê li pêşiya kesên ku xwesteka wan di warê hunerî de deye, me dest bi çalakî û perwerdeyan kir. Di destpêkê de me çalakiyek ji bo 15'ê Sibatê roja komploya Navnetewî ya li ser Rêber Apo hat pêkanîn, li dar xist. Herwiha me îsal di Cejina Newrozê de jî, bi çalakiyên hunerî û çandî li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Şam û Libnanê pîroz kir. Îsal weke sala yekem bû ku li kantonên rizgarkirî weke Reqa û Dêrazorê û hwd, Cejina Newrozê hat pîrozkir. Di heman demê de jî gelek festîval hatin lidarxistin weke festîvalên şano, dîlan, muzîk û hwd. Yek ji wan festîvalan jî festîvala Şehîd Yekta Herekûl a Şanoyê bû, ev festîval ji festîvalên pir berbelav bû û hêjayî gotinê ye ku li ser asta cîhanê bû. Têkiliya me bi piraniya kom û saziyên hunerî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê re heye, di heman demê de jî dikevin bin sîwana TEV-ÇAND'ê, weke Komîna Şano, Sînema, Hunergeha Welat û hejmara wan nêzî 32 navendan e… Îsal jî me bi tevkariya Hunergeha Welat nêzî 47 stran û 37 kilîpan çêkirin û 24 sitranên nû di festîvala Orkêş de tomar kirin. Komîna Sînemayê jî xebateke berbiçav da meşandin, ku 15 xelekên Rêzefîlma Evîna Kurd hat belavkirin. "

newe girtin, lê PDK'ê astengiyan ji bo hunermendan li ser sînorê Sêmalka çêdike. Gelek hunermendên me yên kurd yên li derve dixwazin tevlî çalakiyên hunerî bibin lê ji ber siyaseta PDK'ê nikarin derbasî vir bibin. Di heman demê de çalakiyên hunerî li derveyî herêmên me çêdibin, komên me dixwazin beşdar bibin, lê dîsa astengî ji aliyê PDK'ê ve derdikevin pêşiya wan. Li aliyekî din jî bi sedema dorpêçiyê li ser Şehba û deverên Helebê di warê li darxistina çalakiyên hunerî de, astengî derdikevin pêşiya me. "

Perwerdeyên hunerî, çandî û îdiyolojî

Hevseroka Tevgera Çand û Hunera Netewa Demokratîk a Mezopotamiya, Sumeya Mihemed girêdayî perwerdeyên çandî, hunerî û îdiyolojî de wiha axivî: " Em weke TEV-ÇAND'ê di heftiyê de du rojan perwerdeyên fikrî û îdiyoleojî didin endamên navendên xwe. Mijarên ku di van perwerdeyan de tên dayîn li ser çand, sinc, parêznameya Rêber Apo, rihê hevaltiyê û hwd… ne. Bi rastî em gelekî hewcedarên van perewerdeyên wisa ne û erka xwepêşxistin û perwerdekirinê dikeve ser milê hemû kesan. Li aliyekî din jî perwerdeyên çandî û hunerî jî ji bo pêşxistina endamên me berdewam in. Tişta xweş û balkêş jî ew e ku tevî şer û êrîşên li ser herêmên me, dîsa gel tevlî van çalakiyên hunerî dibe. Herwiha malbat bi destê zarokên xwe digirin û da ku zarokên wan fêr bibin wan tînin dixin nav kar û xebatên TEV-ÇAND'ê. Herwiha perwerdeyên çandî û hunerî ji bo zarok û mezinan tê dayîn. Hêjayî gotinê ye ku îsal çar kargehên şano ji bo perwerdekirina zarokan li ser asta Kantona Cizîrê hatin vekirin. Di heman demê de jî komînên sînema, govendê û hwd hatin amadekirin. "

Têbînî

Der barê mihrîcana Rojava ya Çand û Hunerê de çend têbînî…

Kemal Necim

Di van rojan de li bajarê Qamişlo Nehemîn Mihrîcana Rojava ya Çand û Hunerê tê lidarxistin, ev mihrîcan ji aliyê Hevgiritina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK`ê ve tê lidarxistin. Li gorî agahdarî û çavdêriyan mihrîcana vê salê ji ya hemû salên berê berferehtir û girantir e, dê bi qasî du hefteyan berdewam bike, hijmareke pir mezin ya rewşenbîr û nivîskar û hunermendan beşdar dibin, her wiha naveroka wê jî dagirtî ye.

Dema ku mirov li çalakiyeke wiha demdirêj û berferh dinêre, bi taybet ku ji neh mihrîcana 6 ji wan li Rojava hatine lidarxistin, hin têbînî têne bîra mirov.

Yek ji van têbîniyan ew e ku, gelo ev mihrîcan êdî dikare bibe mihrîcana salana ya bi navê herêmên Rojavayê Kurdistanê bê lidarxistin, yan dê bimîne mihrîcana yekîtiyeke rewşenbîran.

Li piranî bajarên mezin, yan welat yan herêman salane mihrîcaneke çandê û wêjeyê tê lidarxistin û dibe neynika çand û wêje û hunera wê deverê. Li welatê Kurdan jî li herêma Kurdistanê mihrîcana Dihokê heye, mihrîcana Gelawêj ya Silêmaniyê heye, carê mihrîcana Amedê jî hebû. Li Rojava salane pir mihrîcan û çalakiyên çandî, wêjeyî û hunerî têne lidarxistin. Hin ji wan ji hêla dezgehên fermî yên rêveberiyê, hin ji hêla yekîtî û saziyên nivîskar û rewşenbîran ve têne lidarxistin. Lê yek ji wan çalakiyan nebûye ya Rojava ya giştî ku weke neynika çand û wêje û hunera vê herêmê be.

Mihrîcana salane ku HRRK`ê lidar dixe, piştî nih salan êdî gihiştiya wê aştê ku bibe mihrîcana Rojava (weke herêm), ji ber ku êdî şopa xwe çêkiriye, ezmûna xwe girtî ye û bûye cihê baweriya beşeke berferh ya nivîskar û rewşenbîr û hunermendan, bêyî cudahiya siyasî û ramyarî û ideolocî. Lewma bi nêrîna min de pêwîste êdî saziyên Rêveberiya Xweser ku berpirsê kar û barên çandî ne xwedî li vê ezmûn û projeyê derkevin û vê mihrîcanê bikin mihrîcana Rojava ya salane û ji hemû beşên Kurdistanê mêvanan vexwînin vê mihrîcanê.

Bi vê mijarê ve girêdayî êdî pêwîste HRRK`ê jî ku weke xwediyê vê projeyê ye guh bide naveroka berhemên ku têne pêşkêşkirin û pêşandan. Tê zanîn ku piraniya çalakiyên çandî û wêjeyê ta niha naveroka ku tê pêşkêşkirin nabijêrin. Weke ku ev çalakî bûne meydana her kesî ku xwe weke helbestvan, çîroknivîs û hunermend û lêkolîner bide nîşandan. Bê guman sedemên vê kevneşopiyê jî hene, ji ber salên dirêj ên qedexe û çewisandinê, daner û nivîskar û hunermendan nikaribû bi azadî berhemên xwe bixwînin û pêşkêş bikin, niha jî ew derfet çêbûye, lewma her kesên ku hewildaneke wî va danîne hebû berê xwe dan van şevbêrk û mihrîcanan. Ev rewş her çiqas baş û erînî bû, ewqasî jî bi zirar bû, pir caran berhemên qels û kêm ji beşdaran re têne pêşkêşkirin û aşta çêjgirtin û gudarkirinê xerab dikin û pîvanên bedewî û huneriyê tevlihev dikin. Lewma piştî 9 mihricanan êdî pêwîst e ku HRRK`ê kesên ku vedixwîne çalakiyên mihrîcanê li gorî pîvanên wêjeyî, hunerî û bedewiyê bibijêre da ku karibe peyama xwe ya gespêdan û parastina peyva resen û gotara resen pêk bîne û çalakiyên mihrîcanê nebin egera şêlokirina çem û kaniyên wêje û çand û hunera Kurdî ya resen û bedew.

Kar û xebatên şaredariyên herêma Cizîrê yên 2023’an

Şaredariyên herêma Cizîrê di sala 2023’an de 198 projeyên xizmetguzariyê pêk anîn, herwiha 54 proje jî kar û xebat ji bo qedandina wan tên kirin. cîgira Hevserokatiya Desteya Rêvebirina Herêmî ya herêma Cizîrê, Bêrîvan Umer diyar kir ku êrişên dagirkeriya Tirk li pêş xebatên şaredariyan dibe asteng.

Hemza Sêvo/ Qamişlo

Desteya Rêvebirinê ya Herêmî ya herêma Cizîrê yek ji saziyên ku bi taybet li ser kar û xebatên şaredariyên herêma Cizîrê disekine. Herwiha hemû şaredariyên vê herêmê, kampaniyên cuda, desteyên veguhestinê, rêvebirinên avê, agirkujiyê û hwd… dikevin bin sîwana vê saziyê. Li herêma Cizîrê 17 şaredariyên mezin hene û li ser asta kanton, navçe û bajaran in, weke Şaredariya Qamişlo, Tirbespî, Amûdê û hwd… . herwiha li nik van şaredariyan, 40 şaredariyên din jî li ser asta bajarok û gundan hene. Hejmara kedkarên ku kar û xebata curbecur di şaredariyab de dikin zêdeyî 5 hezaran e.
Tevahiya şaredariyên herêma Cizîrê di destpêka sala 2023'yan de li gor pilana xwe ya salane dest bi kar û xenbata xwe kirin. Hêjayî gotinê ye ku li gorî Nivîsgeha Serjimariyê ya Desteya Rêvebirina Herêmî ya herêma Cizîrê şaredariyên herêma Cizîrê 364 projeyên cuda xistin pilanên kar û xebata xwe de û li gor vê pilanê tevgeriyan.

Pirojeyên Kantona Qamişlo yên îsal wiha bûn:

Li ser asta kantona Qamişlo 220 piroje bûn; 51 ji pirojeyên rastkirina riyan bi beqaya, 23 pirojeyên rastkirina riyan bi kevirên hûr, 10 pirojeyên kenalên av qirêjiyê, 51 projeyên ziftkirina riyan, 51 pirojeyên avê, 9 pirojeyên sazkirinê. 11 projeyên pir û xaçeriyên avê, 3’ê pirojeyên rastikirina riyan û 7 projeyên cûda.
Herwiha ji van pirojeyan jî 106 piroje pêk hatin, di heman demê de kar û xebat li ser 43 pirojeyan tê kirin û 71 pirojeyên din kar li ser wan nehatiye kirin. Rêjeya diravî ya van pirojeyan bi giştî 7 milyon û 102 hezar û 613 dolarên Amêrkî bûn.

Pirojeyên Kantona Hesekê yên îsal jî wiha bûn:

Li ser asta kantona Hesekê 144 piroje bûn; 26 pirojeyên beqaya, 25 pirojeyên rastkirina riyan bi kevirên hûr, 13 pirojeyên kenalên avqirêjiyê, 17 projeyên ziftê, 13 pirojeyên avê, 4 pirojeyên sazkirinê , 17 projeyên pir û xaçeriyên avê, 5 projeyên rastkirin, 10 projeyên kevriyên hûr û ziftkirin, 3’ê projeyên ji bo jinan, 4 projeyên ronîkirina riyan û 7 projeuên din yên cûda.
Herwiha ji van pirojeyan jî 92 piroje hatin pêkanîn û xebat li ser 11 pirojeyan tê kirin û 41 pirojeyên din jî kar li ser wan nehatiye kirin. Rêjeya diravî ya van pirojeyan bi giştî 3 milyon û 733 hezar û 738 dolarê Amrîkî.
Girêdayî kar û xebatên şaredariyên herêma Cizîrê yên îsal jî cîgira Hevserokatiya Desteya Rêvebirinê ya Herêmê ya herêma Cizîrê, Bêrîvan Umer ji rojnameya me re axivî.

Asta kar û xebatên şaredariyan

Bêrîvan Umer di derbarê xebat û pirojeyên şaredariyên herêma Cizîrê de wiha axivî: “Di destpêka salê de civînên ji bo giftugoyên di derbarê hilbijartina pirojeyên sala 2023’an de bi gel re hatin li dar xistin û li gor xwesteka wan ev piroje hatin destpêkirin. Herwiha Rêveberiya Xweser jî mûçeyeke baş ji bo pirojeyên şaredariyan hatin terxankirin û xebatên şaredariyan haten destpêkirin. Lê ji ber ku li herêma Cizîr pirsgirêka ava bajarê Hesekê hebû, lewma beşeke mezin ji mûçeya şardariyan ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê hat dabeşkirin. Pirojeya kişandina avê ji navçeya Amûdê ber bi bajarê Hesekê ve pirojeyeke pir mezin e û xebat, lêkolîn û mûçeyeke mezin jê re divê. Xebat ji bo vê pirojeyê ranewesetiyaye û ji 20 bîran 2 hatine amadekirin û wê 2 stasiyon di demê pêş de werin amadekirin. Li aliyekî din jî pirojeyên riyan di nav xebata şaredariyan hebûn weke kenalên av qirêjiyê , rastkirina riyan bi kevirên hûr û beqaya û hwd… Îsal pirojeyên riyan kêm bûn sedem jî ji kargehên çêkirina riyan bû, ku mijûlî pirojeyên ziftê bûn, weke riya Embara. Di warê ekolojî de ji xwe destpêkê karekî dirust hate meşandin lê di nîvê salê de Desteya Ekolojiyê xweseriya xwe sitand ji şarederiyan û bû sazi-

Astengiyên derketin pêşiya kar û xebatên şaredariyan

Bêrîvan têkildarî astengiyên ku derketin pêşiya kar û xebatên şaredariyan wiha anî ser ziman: “ Yek ji astengiyên ku pirsgirêkan di kar û xebatên şaredariyan de çêdike, kêmbûna kesên bispor di şaredariyan de ye. Derengmayîna ku di warê pirojeyan de çêdibe ji ber kêmbûna enderzyaran e. Gelek şaredariyên me hene ku ji ber kêmbûna endamên bispor rastî pirsgirêkan tên. Helbet da ku ev piroje bi rengekî durist û li gor dilê gel bin pêwîste ev piroje bi dîqet lêkolîn li ser wan werin çêkiri û di demeke kurt de bi dawî bibin. Li aliyekî din jî êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên 4’ê Cotmehê li ser binesaziya herêma me gelekî bandor li kar û xebata şaredariyan kir. Ev zêdeyî 11 salan e ku şaredariyên me pirojeyên girîng ji bo gel pêk tînin û pêşxistineke xizmet guzarî ya berbiçav jî çêkir. Lê van êrîşên dagirkeriya Tirk rewşa binesazî û xizmetguzarî vegerande rewşa salên 2011’an ya xirab. Herî zêde gelê me bi sedema van êrîşan alozî ji aliyê avê dîtin. Ji ber ku stasiyonên elektrîkê bi giştî hatin ruxandin û stasiyonên avê jî bê elektrîk ma, êdî av li ser gel hat qutkirin. Me di vê rewşa awarte de li gor derfetên xwe dikarîbû bibin bersiv ji vê pirsgirêkê re û destekdayîna gel bikin di vê rewşê de. Herwiha Rêveberiya Xweser jî tevlî van êrîşan û encamên wê jî destek da me û hîn jî di vî warî de berdewam e. ”

Li Rojhilatê Kurdistanê darên berû yên sed salî tên birîn

Çalakvana jîngehparêzî bal kişand ser wê yekê ku li Rojhilatê Kurdistanê darên gûzê yên sedsalî ji aliyê mafyayan ve bi piştevaniya dewletê, bi awayekî bi zanebûn û plankirî hatine birîn û xwest, rê li ber wêrankirina zêdetir were girtin.

Li Rojhilatê Kurdistanê, pêkhateyên ‘mafyayê’ yên ku darên berû li herêmên daristanî dibirin, gelekî zêde bûne. Berûyên bi sedsalî yên ku hatine birîn ji Rojhilatê Kurdistanê derbasî deverên din ên Îranê dibin. Tê şîrovekirin ku piraniya darjêkirin neqanûnî girêdayî Muhafizên Şoreşê ne û piştgiriya leşkerî û ewlehiyê werdigirin. Çalakvanek jîngehparêz ku ji ber ewlehiyê nexwest navê xwe eşkere bike, têkildarî birîna daran ji ajansa me re axivî.

‘Xiyanetê li derdora xwe dikin’

Çalakvana jîngehparêzî diyar kir ku birîna daran gihiştiye asteke krîtîk û wiha got: “Niha wêrankirina jîngehê derbasî qonaxeke nû bûye. Çawa ku narkotîkê hemû mal û milkên xwe difiroşe û ji bo destkeftiyên demkurt zirarê dide jîngehê, ji bo birîna daran jî wisa ye. Ji bo pereyekî zêdetir bi dest bixin, hinek darên gûzê yên sedsalî dibirin û dibin bajarên mezin ên Îranê û li wir daran bi buhayên erzan difiroşin. Xiyanetê li axa ku lê dijîn, hawîrdora xwe dikin.”

‘Bi bertîlê daran didizin’

Çalakvana jîngehparêzî anî ziman ku saziyên dewletê destekê didin kesên daran dibirin û wiha dewam kir: “Hikûmet li ser mafyayên ku daran dibire tu sepanan pêk nayne. Heta hinek dezgehên hikûmî û leşkerî yên wek Pasdarên Şoreşê jî piştgiriya wan dikin. Li bajarên wekî Serdeşt, Bane, Merîwanê dema dar tên birîn, ji bo ku derbasî bajarên din bibin, neçar in di xalên kontrolê re derbas bibin û li gorî agahiyên ku me bi dest xistine, hin ji van saziyan bertîlê di ber qaçaxtiya daran de digirin. Hinek ji van qaçaxçiyan jî bûne mafyaya birîna daran.”

‘Ne mimkûn e ku vegere rewşa berê’

Çalakvana jîngehparêzî destnîşan kir ku yek ji mijarên ku herî kêm li ser tê kirin mijara birîna daran e û wiha got: “Gelek welatî texmîn dikin ku şewat sedema sereke ya birîna daristanan e. Lê belê, rastî ev e; Piraniya herêmên ku ji ber şewatê zirar dîtine, bêyî destwerdana mirovan dikarin ji nû ve werin avakirin. Lê dema dar tên birîn an jî daristan dibin erdê çandiniyê, ne pêkan e ku vegere rewşa xwe ya eslî. Ji ber wê jî pêwîst e di vî warî de zanyariyên zêdetir bên dayîn da ku welatiyên me vê meselê fam bikin û em bikarin rê li ber ziyanên zêdetir bigirin.”

‘Wêrankirin bi zanebûn û plankirî ye’

Çalakvana jîngehparêzî amaje bi wêrankirina xwezaya Rojhilatê Kurdistanê û navçeyên din ên Îranê jî kir û got: “Komara Îslamî bi awayekî eşkere kiriye ku jîngeh bi tu awayî ne girîng e. Rewşa Rojhilatê Kurdistanê ji deverên din xerabtir e. Heger li herêmên din bê paşguhkirin, dibe ji ber wê yekê ku kêşeyên jîngehparêzî ne giring in, lê wêrankirina jîngehê li Kurdistanê bi zanebûn û bi plan tê kirin. Hêzên leşkerî, bi taybetî Pasdarên Şoreşê, bi awayekî eşkere daristanan weke metirsîdar dibînin û bi awayên cuda wan dikin armanc.”

Emîna Omer: Di kongreya 4’an de dê guhertin di sazûmaniya MSD’ê de pêk werin

Emîne Omer diyar kir ku di kongreya 4′an a MSD′ê de dê guhertin di sazûmaniya meclisê de çêbibin ku karibe bibe pêngaveke xurttir di qada siyasî û diplomatîk de. Her wiha destnîşan kir ku dê girîngeiyeke mezin bidin dîplomasiya civakî.

Navenda nûçeyan

Sibe (20’ê Kanûnê) dê Kongreya 4’an a Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) were lidarxistin. Hevseroka MSD’ê Emîne Omer biryarên kongreya sêyemîn ên hatin pêkanîn bibîrxist û her wiha bernameya di kongreya 4’an a meclisê de nirxand.

Hevpeyvîn wiha ye:

Gavên siyasî û diplomasî ên ku we avêtine, dan û stadninên wê yên ji bo çareserkirina aloziya Sûriyeyê gihaştin çi astê? Gelo têkiliyên we bi dewletên din re hene?
Bi rastî MSD’ê ji bo lidarxistina kongreya xwe ya 4’an dereng ma. 5 sal di ser kongreya 3’emîn re derbas bûn. Helbet sedemên vê derengbûnê hene. Ji wan sedeman êrişên dewleta Tirk ên li ser herêmê, dagirkirina bajarê Serêkaniyê û Girê Spî di sala 2019’an, dîsa jî belavbûna koronayê ku demeke dirêj dewam kir. MSD di van salan de gelek kar û çalakî pêk anîn. Ya herî girîng danûstandinên nîştimanî, diyalogên sûriyeyî-sûriyeyî, li hundirê Sûriyê û li Ewropayê gelek hevdîtin û diyalog hatin kirin ku heta niha berdewam dike.
Ev diyalog bi beşdarbûna gelek kesayet, hêz û partiyên siyasî yên demokratîk pêk hatin. Armanc yekkirina sûriyeyan e da ku ji bo dîtina çareseriyeke siyasî ya guncaw ji aloziya Sûriyeyê re li hev bikin, ji ber ku aloziya Sûriyeyê bûye dosyayek di destê hêzên herêmî yên dixwazin temenê aloziyê dirêj bikin.
Di hevdîtin û diyalogan de ku me li hundir û derve bi hêzên siyasî, kesaysetên serbest ên demokratîk pêk anîn, me gelekî li ser siberoja Sûriyeyê û aloziya ji ber rewşa aborî ya xirab a li Sûriyeyê nîqaş kir, nemaze ku gelê Sûriyê ji bo nebûna çareseriyê ji vê aloziyê re gelekî êş kişandiye.
Di encama van hevdîtinan de rihetiyek ji hêla alî, hêz û kesayetan ve çêbûn ku bi lez muxalefeta demokratîk a Sûriyeyê ya li derve bighîne hev.
Belê aliyên navneteweyî hebûn jî hemû me nîqaş bi wan re kir. Hevîtin hîna berdewam dike. Hevdîtina herî dawîn li Stokhomê bû, di serî de DYA’yê, piştevaniyeke rasteqîn ji aliyê dewletên rojava (Fransa, Siwêd û Brîtanyayê) ve hebû.
Hevdîtinên ku vê dawiyê pêk hatin, diviyabû ku bi lidarxistina kongreya hêz û kesayetên serbixwe bi encam bûba, lê ji ber mercên ku herêm tê re derbas bûn û ji ber mercên navneteweyî kongre di dema xwe ya guncaw de pêk nehat.

Gelo di navbera we û hikumeta Şamê de peywendî hene?

Tu diyalog di navbera MSD û desthilata Şamê de çênebûn. Hevdîtinên ku pêk hatin jê bê encam bûn ji ber ku ne cidî bûn.

Asta lihevkirina we û hêzên din ên siyasî çi ye?

Di salên dawîn de hinek lihevkirin di navbera MSD û aliyên din ên siyasî de çêbûn. Lihevkirina di navbera aliyên siyasî de helbet wê wateyê dide ku bername yan jî xebatên aliyên din tê qebûlkirin. MAS`ê wek çarçoveyeke siyasî ya nîştimî û sûriyeyî, xwedî bernameyeke diyar bû ku Sûriyeyeke pirreng û nenavendî ava bibe. Em bi çareseriya siyasî, diyaloga nîştimanî re ne. Lihevkirin bi hin hêzên mîna Partiya Vîna Gel, Heyet Tensîq El Wataniye ya Hêzên Guhertina Demokratîk re hebûn. Belgehên wê lihevkirinê, niyeta aliyên sûriyeyî ku bigihêjin çareseriyekê rave dikin.

5 sal li ser dagirkirina Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî re derbas bû, beriya wê jî herêmên din ên Sûriyeyê hatin dagirkirin. Rojane sûc li wan herêman tên kirin. Gelo ji bo vegerandina wan herêman, gavên siyasî û dîplomasî ku MSD`ê davêje çi ne?

herêmên dagirkirî, ji xebatên siyasî û dîplomasî yên pêşîn ên MSD`ê ne. Her tim ev dosya li ser maya nîqaşên me bi tevahî aliyan re ye. Em di vî alî de zextê dikin ji bo ku çareseriyeke bingehîn ji wan herêman re bê dîtin. Ku fişarê li aliyê Tirk were kirin ji bo ku ji Sûriyeyê vekişe, vegera ewle ji koçberên wan herêman re peyda bibe ku ji ber sûcên dewelta Tirk a dagirker û çeteyên wê, jê koçber bûn.

MSD`ê di kongreya xwe ya 4`an de, çi dixwaze bi dest bixe, gelo wê guhertin hebin lê na, planên wê çi ne?

Min bi bîr xist ku li ser asta navneteweyî, herêmî û navxweyî guhertin rû didin. MSD`ê wek hevalbendiyeke siyasî, dibîne ku pêwîst e sazûmaniya xwe biguhere. Erê wê guhertin di sazûmaniya meclisê de çêbibe û dê derî li pêşiya partiyên din were vekirin ji bo ku tevlêbûn firehtir bibe.
Ev sazûmaniya nû, dê destpêkeke nû ya bi hêztir be, dê rê li pêşiya pêşxistina xebatên siyasî û dîplomasî bi dewletên ereb û derve û Ewropayê re veke. Bi rêya sazûmaniya nû, em ê ji vê bêtir girîngiyê bidin aliyê mirovî, koçberan û penaberan û girtiyan.

Kongre 20`ê Kanûnê li dar dikeve, wê kî tev lê bibe û mijarên dê werin nîqaşkirin çi ne?

Li ser asta Sûriyeyê, ev kongre bûyereke mezin e, ji ber ku wê gelek partî û hêzên siyasî ji herêmên Sûriyeyê tev lê bibin.
Wê rewşa Sûriyeyê di pêvajoya borî de, sedemên derengmayîna çareseriyê, kûrbûna aloziyê, aliyên ku hewl didin temenê wê dirêj bikin, çima pêvajoya siyasî hate paşguhkirin, çima ji bo çareseriyê însiyatîf tune ne, werin nîqaşkirin û nirxandin ji bo ku di encamê de bigihêjin nêrînekê ku çareseriyê bibînin.
Wê zêdetirî 300 kesayet ji herêmê û derve tev li kongreyê bibin. Lê deriyên sînor pirsgirêk in, ji ber wê, dê gelek kesayet bi rêya Zomê tev li kongreyê bibin.
Çaverê bû ku MSD`ê kongreya xwe ya 4`an sala 2020`an li dar xistiba, lê dagirkirina Serêkaniyê û Girê Spî sala 2019`an ji aliyê dewleta Tirk ve, nehişt ev kongre li dar keve.

‘Girtina rojnamevanan, dîlgirtina dengê civakê ye’

Navenda nûçeyan

Rojnamevanê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê destnîşan kirin ku revandina rojnamevanan dîlgirtina Rojnamevanan e. Herwiha siyaseta PDK û AKP’ê hertim rojnamevanan hedef digre. Rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê anîn ziman ku hemû hewildanên ji bo azadiya Silêman Ehmed bêbersiv mane.

Ev bû 57 roj ku edîtorê Rojnwesê, Silêman Ehmed ji aliyê PDK’ê ve hatiye revandin. Silêman ji Efrînê ye û piştî dagirkirina Efrînê ji aliyê dagirkeriya Tirk ve diçe Başûrê Kurdistanê û li Silêmaniyê di nava xebatên ajansa Rojnwes de karê rojnamegeriyê dike. Di roja 25’ê Cotmehê de û dema Silêman Ehmed xwest di heman riya tê re derbasî Rojava bû vegere ser kar xwe, lê piştî wê agahiya malbat û hevalên wî jê qut dibe.
Ev çend sal in bi rengekî fermî li Başûrê Kurdistanê dimîne û xebata xwe didomîne. Dema ku xwest ji bo serdana malbatê di deriyê Sêmalka re derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bibe û pitşî ku serdana xwe bi dawî kir û xwest careke din vegere Başûrê Kurdistanê û piştî çend rojan hate zanîn ku ew ji aliyê desthiladariya

Evîn Ibrahîm

Hewlêr ve hatiye girtin.
PDK’ê bi hinceta ku Silêman Ehmed li diijî nirxên kurdayetiyê kar dike, hate revandin.
Girêdayî revandina Silêman Ehmed û siyaseta PDK’ê ya li dijî rojnamevanan jî Endama Desteya Yekîtiya Raghandina Azad (YRA) Evîn Ibrahîm û edîtorê ANHA’ê Gîvara Şêx Nûr ji rojnameya me re axivîn.

‘Xeterî li ser jiyana rojnamevanên Başûr heye’

Evîn Ibrahîm diyar kir ku siyaseta PDK’ê xeteriyê li ser jiyana rojnamevanên Başûrê Kurdistanê çêdike, herwiha nimûneyên weke Silêman Ehmed pir in û wiha domand: “ Ev bûye nêzî 2 mehan ku rojnamevan û edîtorê Rojnwesê ji aliyê PDK’ê ve hatiye revandin. Bêguman ev yek siyaseta PDK’ê li hember rojnamevanan

Gîvara Şêx Nûr

û kurdên Başûrê Kurdistanê dide destnîşankirin. Ev ne cara yekê ye ku PDK’ê rojnamevanan digre, lê belê nimûneyên weke Silêman Ehmed pir in, weke Şêrwan Şêrwanî, Kawa Germiyanî û hwd… Herwiha bi awayekî rojane, rojnamevanên Başûr rastî binpêkirinê tên û di roja îro de siyasta PDK’ê xeteriyê li ser jiyana wan çêdike û nema dikarin bi azadî xebata rojnamegeriya azad bikin. Ev zêdeyî çend salane ku rojnamevan Silêman Ehmed karê rojnemegeriyê dike. Wî li Başûrê Kurdistanê dengê gelê kurd dighand tevahiya cîhanê. Lê îro çarenûsa rojnamevan Silêman Ehmed ne diyar e û metirsî li ser jiyana wî heye. ”

Ji bo helwesta YRA’yê û rojnamevanan ‘PDK’ê bêdeng e’

Endama Desteya Yekîtiya Raghandina Azad, Evîn Ibrahîm anî ser ziman ku YRA’yê, herwiha rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê helwest û şermezarkirina xwe ji bo azadkirina Silêman Ehmed gihandin sendîqaya rojnamegeriyên ya Başûr, lê ji bo vê yekê PDK’ê bê deng e û wiha axivî: “Em weke Yekîtiya Raghandina Azad û tevahiha rojnamevanên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê revandina Silêman Ehmed şermezar dikin. Me ji bo azadkirina edîtorê Rojnwesê gelek çalakî û daxuyanî li dar xistin. Ji bo heman mijarê jî, me têkilî bi sendîkayên rojnemevaniyê yên Hewlêr û Dihokê re kir. Di heman demê de me weke Yekîtiya Raghandina Azad, ji bo azadkirina Silêman Ehmed, hwldan li ser asta navdewletî jî kirin. Lê van sandîkayan bersiva me neda. Bêdengiya van sendîkayan siyaseta PDK’ê û desthiladariya hikumeta Başûrê Kurdistanê ya di derbarê rojnamevanan de dide nîşandan. PDK’ê bi siyaseta xwe ya li dijî rojnamevanan derqanûnî tevdigere û ev kiryarên wiha nakevin xizmeta gelê kurd û hevrêziya kurdî. ”

‘PDK û AKP’ê hertim rojnamevanan hedef digrin’

Edîtorê beşa Rojhilata Navîn ya Ajansa Hewarê(ANHA), Gîvara Şêx Nûr da zanîn ku PDK û AKP’ê bi awayekî tundar binpêkirine di derheqê rojnamevanan de pêk tîne û wiha got: “ Kesên rojnamevan li gorî pîvanên exlaqî kar dikin û dibin dengê civaka xwe, girtin û binpêkirna her rojmamevanekî dîlgirtina dengê civaka wî ye. Siyaseta PDK’ê ya di girtina rojnamevanên Başûrê Kurdistanê de berdewam e. Girtina Silêman Ehmed nimûneya siyaseta PDK’ê ya di derheqê rojnamevanan tevan de, dide xuyakirin. Dewleta Tirk a dagirker û hikumeta AKP’ê jî heman siyasetê li ser rojnamevanên Bakurê Kurdistanê, herwiha Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî dimeşîne. Dagirkeriya Tirk ne tenê rojnamevanan digre, lê belê rojnamevanên me bi sedema êrîşên dagirkeriya Tirk şehîd dikevin. Weke şehîd Îsam Ebdela ku yek ji nûçegihanê ANH’ê bû û sala bûrî di êrîşeke dagirkeriya Tirkiyê de şehîdket. Gelek kiriyarên din di derheqê rojnamevanan de ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û PDK’ê ve tên kirin. Hertim jî bi destên wan rojnamevan tên hedevgirtin. Ev tê wateya ku siyseta ku dagirkeriya tirk û PDK’ê li dijî rojnamevanan heman siyasete. ”

‘Armanca TEV-DEM’ê pêşxistin û rêxistinkirina civakê ye’

Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM’ê ku di nava xwe de rêxistin, sendîka, komele, meclîs, sendîkayên pîşeyî, weqif, navendên lêkolîn û perwerdehîyê dihewîne, li ser esasê Netewea Demokratîk û ji bo gihiştina civaka exlaqî, polîtîk, ekolojîk û azadiya jinê di nava salekê de xebatên berfireh da meşandin, herwiha ji bo parastina nirxên civakê, jiyana hevbeş, cihêrengiya çandî û etnîkî û parastina mafên beşên civakê gavên girîng avêtin.

Ayîşa Silêman/ Qamişlo

Bi riya TEV-DEMê gelek karên rêxistinî hatine kirin, di hemû beşên civkê yên ku hene, yekîtiyên wan hatine avakirin, di nav van yekîtiyan de jî hevserok hatine hilbijartin. Her wiha hin avakirinên ku di sala 2022’an de bidawî nebûbûn sala 2023’an de hatin bi dawî kirin, wek; di minbicê de yekîtiya bijîşkên lawiran û komeleya Tirikmanan hat avakirin.

Di derbarê kar û xebatên TEV-DEM’ê ya sala 2023’an de endamê Qordîna Civaka Demokrat beşê rêxistinî, Ayîd Birahîm û Berdevka Ofîsa jin di Tevgera Civaka Demokrat de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê Zeyneb Hesen ji rojnameya me re axivîn.

Ayîd Birahîm

Zeyneb Hesem

Kar û xebatên TEV- DEM’ê

Ayîd Birahîm diyar kir ku kar û barên me di aliyê rêxistinî de li ser hemû yekîtî û Odeyên me tê seknandin, her wiha tekmîl û raporên me hene ku yekîtiyên me tên gel hev wek ofîsên rêxistinî rapor tên xwendin û nirxandin li ser kar û barê mehê tê kirin û wiha got: “Li ser asta herêmê komcivînên salane tên çêkirin, di aliyê rêxistinê de jî em kar dişopînin û bi hevserokên yekîtiyan re dibin alîkar. Ji ber ku çiqasî em di aliyê rêxistinê de serkeftî bin hewqasî wê karê me jî serkeftî be. Rojane em sardana ofîsan dikin, dema ku pirsgirêkên wan hebin em wek ofîsa rêxistinê bi karê xwe radibin û vê pirsgirêkê digrin ser milê xwe, her wiha li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê di milê perwerdeyê de em semîneran didin, di hemû beşên bîrdozî de hemû yekîtiyên me di mehê de herî kêm 2 caran perwerdeyên xwe yên bîrdozî dibînin û di hefteyê de carekî pirtûkên Rêber Apo dixwînin û niqaş ser tê kirin,”

Perwerdeyên ku bi riya TEV-DEM’ê tên dayîn

Ayîd Ebirahîm di berdewamiya axaftinên xwe de got: “Ji bo parêzeran perwerdeyên meslekî tên dayîn, herwiha perwedeyên destwerdana lezgîn bajar bi bajar û ji hemû yekîtî û ofîsên me re û him ji ciwanan re jî tên dayîn. Di heman demê de perwerdeyên me ji bo kombiyûterê tên dayîn, ji bo bilindkirina asta karmendan di karê wan de, heftane li bexçê xwendinê semîner tên dayîn ji hêla rewşenbîran ve. Him di aliyê wêje, ziman û dîrokê ve û ji bona bilindkirina asta civakê ji milê çandî ve kar û xebat tê kirin. Ji bona nivîskarên ku pirtûkên wan hatine çapkirin îmzekirina pirtûkên wan rewşenbîran têne çêkirin. Li ofîsa me ya li pêşesaziyê, me serjimarî ji bo zarokên ku li pêşesaziyê kar dikin çêkirin, yên temenê wan bin 12 salî re 203 zarok bûn û yên temenê wan ser 18 salî re 1100 zarok bûn, ku di pêşesaziya bajarê qamişlo de kar dikin. Her wiha bi boneya roja cîhanî ya zrokan, spasname li zarokên ku li dibistan û pêşesaziyê kar dikin hatin belav kirin, û wek karekî civakî jî me ji bo wan şahî li bexçeyê xwendinê çêkir”

Şopandin karê yekîtiyan bi riya civînan

Ayîd Ebrahîm wiha pê de çû û got: “Civînên me her meh tên çêkirin li ser kar û barê yekîtiyan û nirxandina karê wan. Di heman demê de em guh didin pêşniyarên wan, hemû yekîtî û odeyên me beş û beş civînên xwe yê salane çêdikin. Piştî civînên salane em ê derbasî konfiransan bibin û di konfiransê de biryara guhertina rêveberên Ofîsan tê lidarxistin, ew rêveberên ku du salên wan çêbûne û pêwîstiya guhrtina cihê wa heye, her wiha guhertin di kar û barên me de jî tê çêkirin. Hin kêmasiyên ku bi me re derbas bûne di van konfiransan de em ê, hewilbidin ku wan çareser bikin. Ekademiya me ya civaka sivîl, di salê de zêbeyî 10 dewreyên perwerdeyê têde têne dayîn û jimara kesên ku tevlî dibin ji 20 heya 25 kesî ne, perwerde 26 rojan dirêj dike. Perwerdeya wan him di aliyê bîrdozî û fikrî de ye, her wiha hin saziyên me perwerdeya diblomasî û bi riya onlayîn têkiliyên xwe bi yekîtiyên derve re çêdikin. Mîna yekîtiya kedkaran li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê têkiliya wan bi kedkarên Emrîkî, bernameyên xwe yên 6 mehên pêş deynin. Weke din jî em hazirtiya civîna xwe ya salê jî dikin. Êrîşên dewleta tirk astengî li pêşiya me çêkirin, civîn û serdanên me jî hemû sekinîn. Di heman demê de hin pirojeyên me hene weke xurtkina yekîtiyan di milê rêxistinê de. Ji ber ku di hin yekîtiyên me de cihê jinê vala maye û em dixwazin dagirin û em ê di dema pêş de giraniyê bidin milê perwerdeyê. Ji ber rola jinê û guhertina zihniyeta mêr, hêvî dikim ku hemû jin tevlî yekîtiyên me bibin û bikevin nav kar û xebatê û di nava civakê de xwe isbat bikin”

Ayîd Birahîm xwe doman û wiha got:”Her wiha yekîtiyên ku nehatine avakirin tên avakirin, di nav yekîtiyên me yên esnafan de zêdeyî 30 yekîtiyê heye, lê di nav wan de hin yekîtiyên me li bajaran kêmin û hin bi hin têne avakirin. Yekîtiya bijîşkên diranan li bajarê Kobanê hazirî tê kirin ku were avakirin, TEV- DEM’ê di nav van salan de, heya asteke gelek baş karîbû bibe bersiv ji civakê re. Her wiha bandor li gel jî hat kirin ku karên xwe bi xwe birêxistin bikin. Mîna yekîtiya bijîşkan û bi alîkariya hin yekîtiyên din re karîn kilînîkên gel avabikin. Hin pirojeyên kedkaran hene lê hîn li ser erdê nehatine pêkanîn; wek vekirina medceneya mirîşkan û xaniyên bilastîk ji bo çandiniyê.”

Astengiyên ku TEV-DEM rastî wan tên

Endamê Qordîna Civaka Demokrat Ayîd Ebrahîm di dawiya axaftina xwe de got:”Astengiya ku herî zêde me dikşandin êrişên dagirkeriya tirk li ser cotkaran û astengiyên li pêşiya wan di milê cotkirin û rakirina demsala berhemên xwe. Herwiha mamoste jî astengiyan dikşînin, ji ber ku li seranserî sînorê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi Tirkiyê ve û ji ber êriş û topbaranên ku rojane ji milê dagikeriya tirk ve têne kirin, gelek dibistan hatine wêrankirin û yên din jî ji ber êrişan hatine valekirin. Astengiya herî mezin ji Dêrikê heya Minbicê û êrîşên dagirkeriya Tirk yên rojane têne kirin û her kesî hedef digrin. Ji ber vê yekê hêviyên me ew e ku em ji gelê xwe re bibin bersiv û him di aliyê rêxistinî û him ji milê civakî û xizmet guzariyê de jî pêdiviyên civakê pêkbînin. Li gorî vê yekê pêwîste ku di nava xebatên Tevgera Civaka Demokrat de şoreşeke hişmendî pêkwere da ku civak bikaribe ji hemû milî ve rêxistina xwe avabike û li hemberî hemû êrişan liberxwe bide û xwe li ser piyan bigre. Ji ber ku civakeke bi rêxistinkirî û xwedî felsefe û hişmendî be, wê serkeftina xwe tekez bi dest bêxe.”

Kar û xebatên ofîsa jin di TEV-DEM’ê de

Berdevka ofîsa jin di Tevgera Civaka Demokratîk de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê Zeyneb Hesen, diyar kir ku kar û xebatên ofîsa jin a sala 2023’an, bi giştî

bername deynabûn pêşiya xwe û li ser perwerdeyê bisekinin, mîna; perwerdeya jinên ku di yekîtiyan de kar dikin, him kedkarên ku di kargehan de kar dikin û bi karê çinînê ve mijûl dibin û wiha got:”Em perwerde û semînerên vekirî didin wan. Di heman demê de di Ekademiya Civaka Sivîl li Hesekê çend perwerde bi taybet ji bo ku jin bi xwe xwe biparêze û ew bi xwe mafê xwe bixwaze hatin dayîn. Bêtirî 350 civînan, me di sala 2023’an de çêkirin, bi taybet ji bo hevserokên jin û jinên kedkar yên ku di kargehan de kar dikin û em yek bi yek bi wan re rûniştin û me pirsgirêkên wan girtin dest û em li ser sekinîn. Di heman demê de me semîner ji bo mêran jî dan, da ku ew zihniyeta baviksalarî ji me serdana 865 malbatên şehîdan û malbatên welatiyan kirin, her wiha piştî nirxandina kar em ê, bernameyên xwe yên 6 mehên pêş deynin. Weke din jî em hazirtiya civîna xwe ya salê jî dikin. Êrîşên dewleta tirk astengî li pêşiya me çêkirin, civîn û serdanên me jî hemû sekinîn. Di heman demê de hin pirojeyên me hene weke xurtkina yekîtiyan di milê rêxistinê de. Ji ber ku di hin yekîtiyên me de cihê jinê vala maye û em dixwazin dagirin û em ê di dema pêş de giraniyê bidin milê perwerdeyê. Ji ber rola jinê û guhertina zihniyeta mêr, hêvî dikim ku hemû jin tevlî yekîtiyên me bibin û bikevin nav kar û xebatê û di nava civakê de xwe isbat bikin”

Hevpeymana Civakî yek ji destkeftiyên şoreşa 19’ê Tîrmehê ye

Endama Komîteya Sazkirina Hevpeymana Civakî, Perwîn Yûsiv destnîşan kir ku Hevpeymana Civakî yek ji destkeftiyên şoreşa 19’ê Tîrmehê ye. Di heman demê de Perwîn da zanîn ku ev hevpeyman bi nêrînên gelên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat li gorî hewcedariya bi xwerêvebirin û biryarstndinê hat sazkirin.

Navenda nûçeyan

Di 12'ê Berfenbarê Rêveberiya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hevpeymana Civakî bi 134 madeyên cuda û cihêreng derxist. Têkildarî vê hevpeymanê jî Endama Komîteya Sazkirina Hevpeymana Civakî, Perwîn Yûsiv bersiva pirsên me da û hevpeyvîn jî wiha bû:

Reşnivîsa hevpeymana berê ji 99 madeyan pêk dihat, lê ya niha 134 made ne, guhertinên ku tê de pêk hatin çi bûn û çi pêwîstî pê hate dîtin?

Hevpeymana Civakî weke destkeftiya gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi saya şoreşê hatiye amadekirin. Ji sala 2014'an ve bi avabûna Rêveberiya Xweser re hevpeymaneke civakî ji aliyê rêveberiya kantonên bajaran, partiyên siyasî, rewşenbîr û hwd... ve hat çêkirin. Êdî li gor wê hevpeymanê sîstemên rêvebirinê yên civakî, aborî û hwd dihatin sitandin û meşandin. Hevpeyman weke tecrubeya sala 2014'an heta berî vê hevpymana nû bingeh dihat girtin. Lê piştî ev qas dem, xebat û tecrubeya mezin, kar ji bo hevpeymaneke nû hat kirin. Me berî sal û nîvê reşnivîsek bi 99 xalan nivîsand, herwiha ev reşnivîs kete diyalog û nîqaşeke berfireh li ser hat kirin. Di heman demê de me gelek hevpeyvîn bi gel re jî ji bo sitandina biryarên wan di derbarê madeyên vê hevpeymanê de girtin. Ji ber vê yekê jî, madên ku li reşnivîsa Hevpeymana Civakî hat zêdekirin, madeyên gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn. Yek ji van madeyan jî rizgarkirina herêmên ku hatine dagirkirin û gelek madeyên zelal yê din hatin berçavgirtin û hevpeymaneke ku mafê hemû pêkhateyan diparêze hate derxistin.

Ji wan guhertinên sereke ku pêk hatine çi ne?

Yek ji guhertinê sereke di warê desteyên cîbicîkar yên Rêveberiya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de pêk hatin. Her herêm û kantonek desteyekê wê yên aborî, daravî, têkiliyê, civakî, jinê û hwd… hebû û desteyên cîbicîkar karê xwe bi serbixwe û fermî dikirin. Li nik vê yekê jî Tevgera Civaka Demokratîk jî xebat dida meşandin. Lê vê hevpeymanê guhertinek di warê şêwazê rêvebirin û biryargirtinê de pêk anî û li rex her desteyekê meclisek hat ava kir. Saziyên Tevgera Civaka Demokratîk ji beşeke mezin a gelên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tê. Me xwest ku hevbeşî bikeve nav kar û xebatên saziyên heyî û da ku li aliyekî din jî gel di xebata van deste û meclisan de beşdar bibe, pêwîstî bi vê yekê hebû ku tevlî rêvebirina karên cuda bibe. Li ser vê bingehê jî dê ji şaneya biçûk heta bi ya herî mezin ji Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li nik TEV-DEM'ê bi awayekî hevbeş bixebitin. Herwiha meclis û desteyên kantonan kar û xebatê bi rê ve dibe, armanca me jê ew e ku nêzîkatiyek hîn bêtir di navbera gel û saziyên Rêveberiya Xweser de ji bo biryargirtinê û hwd… were pêkanîn. Herwiha ev guhertin ji bo têkbirina hemû rengên bîroqiratiyê û desthikatdariyê ye.

Hevpeymana Civakî xwe dispêre kîjan paradîgma û bîrdoziyê, herwiha pêkanîna van madeyan ya di qada pratîkê de dê çawa be?

Li ser asta cîhanê her destûrek yên rêvebirinê xwe dispêre hişmendiya dewletekê an siyaseteke cuda û li gor wê siyaset û hişmendiyê tevdigere. Hevpeymana Civakî jî ji bo me, rêvebirina herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Bêguman ev hevpeyman jî xwe dispêre felsefe, hişmendî û nêrînekê. Felsefe û hişmendiya Hevpeymana Civakî ji xwe re dike bingeh, felsefeya Netewa Demokratîk e. Ev hevpeyman jî pirrengiya gelan û biratiya gelan qebûl dike. Herwiha xwe dispêre paradîgma û îdiyoljiya Rêber Apo ya ku nexşerêya şoreşa 19'ê Tîrmehê ya ku xeta sêyem ji bo azadiya gelan saz kiriye. Di heman demê de bi fikr û feslefeya xwe piştgiriya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kiriye. Ev hevpeyman xwedî nirxekî pir buha ye, lewma hemû pêkhateyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê erkdar û berpirsiyarên pêkanîna xalên Hevpeymana Civakî ne. Divê kar û xebatên piratîkî li gorî sincên mirovahiyê ji komînê heya saziya bilind a Rêveberiya Xweser pêk were û bidome. Piratîkbûna Hevpeymana Civakî destpêkê li ser hişmendiya civakê û her kesî dimîne ku çiqasî pêk bîne. Dem hatiye ku em ji tecrîbeya şoreşa 19'ê Tîrmehê ya ku bû mînaka şoreşên cîhanê, sûd bigirin. Lewma ji bo ku xalên hevpeymanê bikevine meriyetê de divê gelên me xwedî li vê hevpeymana giranbuha derkevin.

Ji bo azadî û mafên jinan bi taybetî guhertinên çawa pêk hatin?

Di vê Hevpeymana Civakî de xaleke sereke hatiye bibîrxistin ku hemû rengên nijadperestiyê tê redkirin. Herwiha hewldana têkbirina zayendperestiyê jî di nav vê xalê de tê dîtin û azadiya mêr tê bingehgirtin. Mafê jinê weke mêr di rêvebirinê de heye ango divê weke hev bin. Lê berî ev Hevpeymana Civakî saz bibe, rêjeya jinê di rêvebirina saziyên abûrî, civakî û hwd... de 40 ji 100'î bû. Piştî 12 salan ji şoreşê, jinê xwe di qada leşkerî, siyasî, civakî û hwd... isbat kir. Derket holê ku jin dikare mîna mêran biryarê bigre, bibe berpirsiyara hemû tiştan û xwe bi rê ve bibe. Lewma di vê hevpeymanê de rêjeya jinê di biryargirtin, rêvebirina komîn, meclis, deste û hemû saziyan de zêde bû û gihaşt 50 ji 100'î.

Di hevpeymanê de behsa hilbijartinan tê kirin, ew hilbijartin dê çawa pêk werin, awayê pêkanîna wê dê çawa bin?

Rêveberiya Xweser wê di destpêkê de Desteya Bilind a Hilbijartinê ava bike û pê re jî zagonên hilbijartinê jî werin diyarkirin. Di Hevpeymana Civakî de hatiya nivîsandin ku ji 100'î 40 ji teknoqratiyê re ye. Herwiha rêjeya din a ku 60 e, ji hilbijartinê re ye, ev rêje tev xalên sereke yên awayê berfirehiya hilbijartinan digire nava xwe. Kar û xebat li ser berfirehiya xalên sereke û zagonên hilbijartinê tê kirin û wê di demeke nêz de werin derxistin. Êdî wê saziyên Rêveberiya Xweser, partiyên siyasî, kesayetên serbixwe û teknoqirat li gorî van zagonên hilbijartinê namzetên xwe pêşînyar bikin. Di heman demê de jî wê gel bi serbestî namzetên xwe diayr bikin. Di dema heyî de li gor rewş û mercên ku em têre derbas dibin em nikarin dest bi hilbijartinan bikin, lê dîsa jî hewldanên pêkanîna hilbijartinan hene.

Di madeya 133yan de we behsa guhertin û nûkirinê kiriye, şert û mercên wê yekê çi ne?

Ev made dide tekezkirin ku herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşek ji Sûriyê ye û em parçebûna xaka Sûriyê naxwazin. Lê belê Hevpeymana Civakî ya ku hate raghandin, ji bo yekbûna gelên Sûriyê û xaka wê ye. Ev hevpeyman jî ji aliyê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve hatiye nivîsîn. Şert û mercên gurhertina vê hevpeymanê jî, wê di rewşekê de were guherandin, ew jî dema ku mafê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di hevpeymaneke sûrî de were çêkirin. Em di dema niha de hewcedarî hevpeymaneke wisa ne ku hemû pêkhatên vê herêmê xwe bi rê ve bibin. Di heman demê de em tekez dikin ku ev hevpeyman ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê cihê çareseriyê ye. Herwiha deriyê nûkirin û guhertina Hevpeymana Civakî ji bo xizmeta gelên Sûriyê çi kurd be çi erbeb, suryan û hwd... re vekirî ye.

Dorpêça Şêx Meqsûd û Şehbayê

Zekî Bedran

Hikumeta Şamê dorpêça xwe ya li ser herêma Şehbayê didomîne. Ev herêm herêmeke ku gelê ji Efrînê hatine jî lê bicih bûne. Deh hezaran Efrînî di çadiran de û li herêmê dijîn. Li herêmê derfetên jiyanê sînordar in. Heman demê de herêmeke ku hêzên Sûriyê, Îranî û Rûs jî lê hene. Şêniyên Ereb jî lê hene. Kurd û Ereb, hêzên din di nav hev de ne. Heman demê de taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yên Helebê jî Kurd lê dimînin. Kurdan li van taxan pir li ber xwe dan. Rolek girîng di parastina Helebê de lîstin.

Dorpêça hikumeta Sûriyê kêm zêde derdikeve ser ragihandinê. Gelê Rojava pêşketinan ji nêz ve û bi fikar dişopîne. Ji Şehbayê, yan jî ji Şêx Meqsûd gef an jî xeteriyek ji bo hikumeta Şamê tune ye. Niyeta kesî tune ye ku li hember Şamê şer bike. Berovajî jixwe Kurd bi hêzên hikumetê û gelê herêmê re di nava hev de dijîn. Ev ne penaberên ji herêmek din an jî dewletek din in. Hemwelatiyên dewleta Sûriyê ne. Hikumeta Şamê çima hemwelatiyên xwe dorpêç dike? Pêwîste ev pirs werin pirsîn û bi awayek cidî bersiv bên dîtin.

Şam, li şûna ku dorpêçê dane, yan jî wan neçarî xwe bike, eger hêza xwe bi wan re bike yek dê sûdek erênî bide pêşeroja tevahî Sûriyê. Erdoganê faşîst her roj gefan li herêmê dixwe. Ev herêm jixwe di bin gefa dagirkeriya Tirk de ne. Erdogan di rojên derbasbûyî de got, dê ji Til Rifetê destpê bike tevahî herêmên rêveberiya xweser ji hev belav bike û dagir bike. Gefên "Emê ji nişkeve di şevekê de bên" dike û amedekariyên dagirkeriya xwe didomîne. Eger hikumeta Şamê bi gelê herêmê û hêzên wan ên parastinê re bibe yek, dagirkeriya Tirk dê dî domandina dagirkeriyê de zehmetiyan bikişîne. Eger hikumeta Şamê bixwaze dawî li dagirkeriya Tirk bîne, dê bi gelê xwe û hêzên wan ên rêxistinkirî re bibe yek. Li şûna wan lewaz bike yan jî ji cihê wan derbixe, dê wan bike pira yekîtiya netewî.

Piştî hevdîtinên dawî yên Astanayê, helwesta hikumeta Şamê li hemberî Kurdan hişk bû. Em nikarin van helwestên hikumeta Şamê ji têkiliyên bi dewleta Tirk ve cuda bigirin dest. Eger li bîra we be di danezana encama Astanayê de rêveberiya xweser weke rêveberiyek ne rewa hatibû îlankirin. Daxuyaniyên berê cuda bûn. Herêmên xweser, hîn zêdetir jî Kurd weke "Yekîtiya siyasî û axa Sûriyê" dihatin parastin. Rûsyayê car bi car ji bo Tirkiyê provoke bike digot dê DYE ji Kurdan re dewleteki çêbike. Lê cara yekem di hevdîtina dawî ya Astanayê de rêveberiya xweser weke ne rewa hate pênasekirin. Di rastiyê de ev daxuyaniyek bû ku dewleta Tirk dixwest. Lê hişmendiya beşdarvanên Astanayê jî ne cuda bûn. Hikumeta Şamê yan jî Îran Sûriyeyek demokratîk naxwazin. Daxwaz û derdek Rûsyayê ji bo Sûriyeyek demokratîk tûne ye.

Îran, rêveberiya Şamê û Rûsya, ji bo DYE ji Sûriyê derbikeve çi ji destê wan tê dikin. Tirkiye jî ji ber Kurdan li dijî hebûna DYE yê ye. Ji derveyî Kurdan, hikumeta Tirk aligirê mayîna DYE yê ye. Eger bi tena serê xwe bimîne nikare dagirkirina Sûriyê bidomîne. Her çendî nakokî, berjewendî û rikberiyên tevahî hêzan hebin jî, di encamê de armanca van hemûyan ji holê rakirina Kurdan û rêveberiya xweser e. Aştiya navxweyî ya Sûriyeyek demokratîk û bi hev re jiyîna gelan naxwazin.

Dema em di ronahiya van bûyerên siyasî de li pirsgirêkê binêrin, armanca hikumeta Şamê ew ku bi vê dorpêçê serê Kurdan bitewîne û ji wan herêma derbixe. Eger rêveberiya Şamê Kurdan weke endamek esîl ê Sûriyê bibîne, ji bo daxwazên wan ên cuda jiyanê li wan nake jehr. Jixwe gel hejar e. Tevahî gelê Sûriyê hatiye wê rewşê ku nikare henaseyekê bistîne. Dorpêçek giştî heye. Di bin van dorpêçan de dorpêçên din tên danîn. Ev dide nîşan ku niyeta hikumetê çiqas xirab e. Tişta ku gelê Kurd û gelê herêmê dixwazin hinek demokrasî û parastina hebûna çanda wan e. Ev tiştên neçarî ne, mafê wan ê herî xwezayî ye. Ji bo vê pêwîst nake ku bibe dijminê gelan, wan neçarî koçberiyê bike, vîna wan bişkêne yan jî wan neçarî radestbûnê bike.

Zehmetiyên havînê hene lê zivistan rê ji bandorên xirab re vedike. Eger mirov derfetên bicihbûn û xwegermkirinê nebînin dê rê ji mirinê re vebe. Pêwîste rêveberiya Şamê pêvajoyê negihîne rewşa mirinê. Nebe hevkarê politîkayên qirkirinê yên dewleta Tirk. Berovajî li hemberî wêrankariya faşîzma Tirk a li Sûriyê, di serî de bi gelê Kurd û gelê din re bibe yek, yekîtiya xwe ya netewî li ser bingehê demokrasiyê ava bike. Perçiqandin û şikandina vîna gelan ji bo pêşeroja Sûriyê tu sûdê nade. Pratîkên hatine jiyîn dê vê mijarê de tijî ders in.

3 şerên cîhanê

Farûk Sakik

Di 3 şerên cîhanê de tiştên diqewimin dişibin hev. Di her sê şeran de jî hêzên hegemon hatibûn rojhilat. Xetên berjewendiyên wan di nav sînorên Kurdistanê re derbas dibû. Qedera neteweyan û gelan ketibû nav lepên van dewletan.

Şerê cîhanê yê yekem ku li ser dabeşkirina xaka Osmaniyan hatibû destpêkirin, bû sedema dabeşkirina xaka Kurdistanê jî.

Di vî şerî de bi peymana Lozanê qederê kurdan hat xêzkirin. Hejmara dagirkerê Kurdistanê bûn çar. Çar dewlet bi hev re dijmin bûn lê di dijminatiya Kurdan de car din dihatin cem hev. Ev yekîtiya wan a dijminatiya Kurdan dibû sedem ku serhildanên Kurdan bi trajediyên mezin bi dawî bibin.

Şerê cîhanê duyem jî wek vî şerî bû. Dîsa Îngiliz, Sowyet û Fransa li herêmê bûn. Dema ku Îngilizan û Yekîtiya Sowyetan Îran dagir kirin, Rojhilatê Kurdistan ket bin dagirkeriya Yekîtiya Sowyetan. Kurdan jî ev rewş baş bikaranîn xebatên xwe yên bi salan gihandin encamekî. Dema di 22'yê Çileya 1946'an de Komara Kurdistan hat îlankirin, dîsa Sowyet li du berjewendiyên xwe ketibûn.

Lê dizaynkirina Rojhilata Navîn dewam dikir. Hêzên cîhanê yên wê demê Brîtanya û Yekîtiya Sowyetan ji bo hegemonyaya xwe ya li ser Rojhilata Navîn, nehiştin ku Komara Kurdistanê mezintir bibe. Ev her du hêz bi hevkarên xwe yên herêmî komara Tirk û rejîma Îranê dan kêleka xwe û ketin pey tunekirina komara 11 mehî.

11 meh şûnde dema ku Yekîtiya Sowyetan ji herêmê vekişiya dewleta Îranê ya dagirker berê xwe da Mahabadê û Komara Kurdistanê bi dawî kir.

Qazî Mihamed dema ku di Adara 1947'an de îdam kirin, di gotinên xwe yên dawî de wiha digot: "Çavên min li paş namînin, hûn Qazî Mihemed dikujin, lê bi hezaran Qazî wê rabin û wê vê dozê bidomînin." Çavên Qazî Mihemed li paş nemabûn. Sal û dem derbas bûn, bi navê Abdullah Ocalan kesek rabû û ji bo azadiya Kurdistan têkoşiya. Bi demê re Rêber Apo li Rojhilata Navîn behsa konfederalîzmê kir. Ne tenê ji bo rizgariya Kurdan, hin fikir û ramanên wî yên ji bo rizgariya hemû gelên herêmê hebûn.

Dema di destpêka salên 90'î de şerê cîhanê yê sêyemîn dest pê kir, dîtin ku ev şer wê neşibe herdu şerên cîhanê yên din. Çawa ku hêzên modernîteya kapîtalist di şerên cîhanê de dihatin li gel hev ji bo parastina berjewendiyên xwe li hev dikirin, Abdullah Ocalan jî bi paradîgmaya xwe berjewendiyên gelan diparast. Berî ku di 9'ê Cotmeha 1998'an de komplo bidin destpêkirin, di civînên xwe de behsa vî kesî kirin. Wisa bi hêsanî pêşî li vî kesî nedihat girtin. Nedişibiya Seyît Riza û Qazî Mihemed. Rast bû Rêber Apo têkoşîna van herdu pêsengê Kurdan ji xwe re esas digirt. Lê herdu kes ji bo gel trajediyên mezin nejin xwe radestî dijmin kirin û aqûbeta wan jî tê zanîn. Bi aqûbeta wan re aqûbeta serhildanan jî dawî dibû.

Ji ber vê yeke Rêber Apo ji bo ku serhildana doza Kurdistanê ku destpêkirî bi encam bibe, dibûya bijiya. Wisa kir. Di komployê de berê xwe da Ewropa û li van deran şansek da aştiyê. Nebû. Dîl hatin girtin.

Dîsa teslîm nebû û li Îmraliyê jî ev şerê xwe domand. Dema ku di şerê cîhanê yê yekem de Şêx Seîd û di şerê cîhanê yê duyem de Qazî Mihemed hatin îdamkirin, bi der deriyê dadgehan yek Kurd tunebû. Lê dema di şerê cîhanê yê sêyem de Rêber Apo dîl hat girtin, bi dehanînsan li dora wî ji agir xelek çêkirin. Bi Rêber Apo re li Kurdistan statuya Rêbertiyê jî derbasî merhaleyeke nû bû.